



KNK Bulten

Bultena Kongreya Neteweyî ya Kurdistanê * Hj.: 5 * Adar 2008

Rêberê KCKyê Abdullah Ocalan:

Li ser pirsê Kurdî dê wekî ya Kosovayê bête rawestan

"Pirsê Kurdî bûye pirsê navneteweyî. Wekî Kosova, Qibris, Filistin û hetta ji wan jî li pêştir û mezintir pirsê navneteweyî ye.. Li ser vê pirsê, êdî dê wekî wan bête rawestan."

Pakêta AKPyê pakêta şer e

"... Pakêta ekonomîk, şerê ekonomîk e, pakêta polîtîk, şerê polîtîk e, pakêta psîkolojîk, şerê psîkolojîk e. Ewe şerê ekonomîk, şerê polîtîk, şerê psîkolojîk dikin. Bi pakêta psîkolojîk ertêşa pênc sed hizari diajon ser Kurdan. AKP vê pirsê dê bi ertêşê û polîs çareser bike?.. Ewe lêhbandinên mezin in..."

[Dûmahîk di rûperê 7ê da ye.]

Newroza 2008ê û biryardariya neteweyî

Hindek bûn û bûyer û kir û kiryar hene ku ji nav û naveroka xwe mezintir manayê didin. Newroz di serê van da têtin. Newroz herçend "Cejna Neteweyî" jî be û digel xelkê Kurd, di nav xelkên di yên Îranî da jî wekî tradisyona hizaran salî bête pîroz kirin jî, di roja îro da, êdî mana û giringîyeke mezintir wergirtîye. Esasen ewe ji dîroka serpêhatîya Newrozê jî têtin. Newroz li ser bingehê serhildana azadîyê bin girtîye, bejn daye, gihiştîye û her bo her mezintir bûye û gihiştîye îro. Newroz ji ber statuya kolonîbûna Kurdistanê herdaîm bûye meydana cenga neteweyî beramberî dagîrker û kolonyalîstan. Ev tradisyona serhildanî ya Newrozê her sal ji sala borî mezintir têtê domandin. Newroz bi vê manaya xwe ve bûye platforma herî mezin ya berxwedana sivil û demokratîk ya Kurdistanê dijî dewletên kolonyalîst. Newroza îsal [2008] jî ji salên borî mezintir û boştir bû û bi çêş û heyecana xwe ve jî geştir bû û agirê wê jî ji salên berê gurtir bû.

Newroz 2008, li her derê Kurdistanê, li meydana dîsporasê di dereceya herî mezin û bilind da hate pîroz kirin. Bi taybetî li merkezên giring yê Kurdistanê bû pêla boşahîya xelkê.

Bi milyonan Kurd û Kurdistanîyan bajêr, bajêrk, gund û mezra û deşt û zozanên Kurdistanê kirin meydana pîrozbahîya Newrozê. Xelkê Kurd Newroz 2008 kire platforma xwe nîşandana hêza xwe ya mezin. Meydanên stratejîk yê Kurdistanê bûne cihê "mehşer" a Newrozê. Newroz 2008 bi vê karakterîstîka xwe herwisa bû plebîsît jî. Xelkê Kurd mesajên xwe yê ji bo azadîyê gelek zelal û vekirî dane dewletên kolonyalîst û dagîrker.

Xelkê Kurd bi pîrozbahîyên Newroz 2008ê, hêz, şîyan û biryardariya xwe ya di prosesa têkoşîna dijî dagîrker û kolonyalîstan da jî nîşan da.

Bi taybetî wekî dewleteke serkolonyalîst û serdagîrker, dewleta Tirk, bi mezinahîya Newrozê hate hejandin. Newroz 2008ê careke di ji bo dost û dijminan ron kir ku çu hêz û dewlet nikarin xelkê Kurd ji azadîya kamil mehrûm bikin. Newroz 2008 bû beyana îradeya neteweyî. Ev biryardarî şik têda nîne ku dê rêya têkoşîna azadîya Kurdistanê kurt û nêzik bike. **RH**

Di destpêka sala nû da, daxuyanîya Konseya Rêvebir ya KNKYê

Konseya rêvebir ya KNKYê kombûna xwe ya pêşîn ya sala nû, sala 2008e, kir.

Di kombûnê da gotûbêjeke fireh li ser rewşa bi giştî ya polîtîk ya cihanê, rojhilatanavîn û Kurdistanê hate kirin. Herweha li ser rol û wezîfeyên KNKYê jî hate rawestan.

Di meydana navneteweyî da hêz û dewletên serdest yê cihanê di têkilîyên xwe yê dualî û piralî da berjewendiyên xwe dadin serê her tiştî û normên demokratîk û mirovî binpê dikin. Eve di pîrsa xelkê Kurd da bi taybetî di van demên dawîyê da bi zelalî hate dîtin. Hem Amerîkayê, hem jî Yêkîtîya Ewrûpayê [YE], ku du merkezên serdest yê cihanê ne, rola xwe ya çêker bi layiqî neleyistin di rojhilatanavîn da. Armancên pozîtîv yê mirovahîyê, demokrasî û mafên mirov fedayî berjewendiyên xwe yê ekonomîk û polîtîk kirin û xwastek û daxwazên xelkê bindest, xelkê Kurd dane paş. Bi taybetî Amerîkayê di pîrsa Kerkûk û Qendîlê da tawîzên mezin dane dewleta Tirk ku dijîtiya xelkê Kurd bidomîne. Bi vê durûtîya Amerîkayê dewleta Tirk êrişa hewayî bire ser Qendîl û dawîya sala 2007an li xelkê Kurd kire jahr. Herweha referandûma Kerkûkê jî bi fişar û êrişkarîya dewleta Tirk hate paşdan. Dîsa YEyê jî xweşbînîyeke li dijî normên xwe nîşanî dewleta Tirk da. Em wekî KNK vê bênormî û durûtîya Amerîka û YEyê şermizar dikin û careke dî norm û bihayên demokratîk û mafên mirov tînin bîra wan.

Digel vê pozîsyonanegatîvya serdestên cihanê, negatîvîyek jî di navxweyîyê da jî hate dîtin. Pîranîya dînamîkên bi giştî bizava neteweyî ya xelkê Kurd li seranserê welat û derveyî welat, li hemberî van polîtîkên birandêr yê dewletên Tirk û Îranê reftareke pêdivî ya neteweyî nîşan nedan û di vî warî da ketin nav qelsîyeke mezin. Di serî da di pîrsa Kerkûkê da polîtîkeke encamgir ya neteweyî nehate di rê birin. Herweha li hemberî êrişkarîya dewleta Tirk ya piralî da jî rêxistinên Kurd polîtîkeke bi rastî neteweyî nedane pêş. Dijî bombardumana Qendîl û êrişên li çiyayên Botan û Hekarîya jî piştevanîyeke xurt ya neteweyî nehate nîşan dan. Ji teref hindek hêzên neteweyî ve adeta partîya desthilatdar ya hukûmeta Tirk, AKP û serokwezîr Erdogan hatin destek kirin ku eve bi gotina herî sade ji aliyê şuûra neteweyî ve qusûrek e. Her wî Erdoganî fermana êrişa hewayî da ertêşa xwe û piştî bombardumanê û şehadeta gerîlla û gundîyên hejar yê Kurd jî ertêşa xwe pîroz kir!. Di meydana polîtîk ya Kurdî da, ji aliyê rêxistinên polîtîk yê Kurdî ve piştevanîyeke layiq ji bo hêzên gerîlla û KCKyê nehate nîşan dan û em vê yêkê kêmasîyeke mezin dibînin. KNK hêvî dike ku rojek zûtir ev bêberpîrsiyarîya beramberî armancên neteweyî

bête terk kirin û gava pêdivî ya piştevanîya neteweyî bête avêtin û herweha di demekî herî nêzik da “Konferansa Neteweyî” bête kom kirin.

KNK di vî demê hinde nazik û dijwar da bang li xelkê Kurd dike ku li bizava neteweyî û hêza gerîlla xwudan derkevin. Piştî ku HPGyê bi biryara polîtîk ya KCKyê, 8 eskerên dîl yê ertêşa Tirk berdan, baş tete zanîn ku ev 8 esker ji teref dadgeha ertêşa Tirk ve hatin girtin û bi taybetî leşkerên Kurd bi peywendîdarîya gerîlla hatin sûcdar kirin û avêtin hefsa leşkerî û cizayên giran ji wan ra tene xwastin. Vê gavê hemû leşkerên Kurd yê di ertêşa Tirk da li bin fişar û zulmeke nedîtî da ne û bi têkildarîya PKKYê tene sûcdar kirin. Ji vê bûyera dawîyê jî kiviş bû ku çu garantîya jîyana leşkerên Kurd di nav ertêşa Tirk da nîne. Em bangî ciwanên Kurd dikin ku neçine leşkerîya Tirk. Dîsa em gazî dayîk û babên Kurd dikin ku zarokên xwe rênekin leşkerîya Tirk ku vaye dibînin ku hefs û kuştin li pêşîya wan e. Ciwanên Kurd, hem ji ber şuûra neteweyî, hem wijdanen, hem jî ehlaqen bila leşkerîya Tirk red bikin û neçin!

Dewleta Tirk ji bilî hêza xwe ya leşkerî, hemû hêz û dînamîkên xwe yê dî jî seferber kirine dijî xelkê Kurd. Di serî da hêza medyayê wekî hêza leşkerî bi kar tîne. Medyaya Tirk, dijî bizava neteweyî ya xelkê Kurd, wekî hêzeke manipulasyon û şerê psikolojîk weşanê dike û bi timamî di bin fermana ertêşê da ye. Beramberî vê pozîsyona dijminane ya medyaya Tirk ya ertêşwarî, em hêvî dikin ku xelkê me li medyaya xwe ya neteweyî xwudan derkeve û weşangerîya antî Kurd ya medyaya Tirk protesto bike û her bi çi rengî be vê nerazîbûna xwe nîşan bide. Di vê çarçoveyê da em bangî xelkê Kurd dikin ku rojnemeyên Tirk boykot bikin!

Zulm û zora li ser DTPyê jî bi her awayî dom dike û serokê DTPyê Nuredîn Demirtaş jî hatîye girtin. Em bangî xelkê xwe dikin ku parastineke xurt li dor DTPyê vehûnin û lê xwudan derkevin û herweha em gazî dewleta Tirk jî dikin ku rojek zûtir Demirtaş berdin!

Hemleya “Êdî Bes e” jî divêt bi hemû hêz û mezinahîya xwe ve bête domandin.

Tikayeke me ji xelkê xwe jî ew e ku ji bo hevkarîya xelkê me yê feqîr û belengaz û afatzedeyan, rêxistina xêrxwaz Heyva Sor ya Kurdistanê di nav xebat û hewildanan da ye û em hêvî dikin ku xelkê Kurd xêr û bêşên xwe ji Heyva Sor ya Kurdistanê kêm nekin û bi her awayî desteka malî bidinê.

Xelkê me sala nû, sala 2008an, di nav bombe û êrişên dijminan da pêşwazî kir. Lê belê, berxwedaneke mezin jî tete nîşan dan ku eve hêvîya xelkê Kurd bilind dike. KNK bi bawerî ye ku dê ev sale jî ji aliyê berxwedana xelkê me ve serkevtî bibore û çeperên dijmin dê bêne şkandin. Bi vê hêvîyê em ji bo xelkê xwe saleke bi xêr û bêr û tijî serkevtin daxwaz dikin. Dijmin bi hemû êriş û hewildanan

dixwaze hêvîya xelkê me bişkêne. Divêt xelkê me vê xwezîya dijmin di gewrîya wan da bihêle û hêvîya xwe bi têkoşin û berxwedaneke mezin geştir bike. Serkevtin ya xelkê Kurd û Kurdistanê ye.

Konseya Rêvebir ya KNKyê

12 Çile 2008, Bruksel

Rapora encamê ya kombûna Komisyona Jinan ya KNKyê

Li kombûna me ya 13ê Sibate, ji bilî Hêvî Berwarîyê, hemû endam beşdar bûn. Du xalên rojeva kombûnê hebûn; hazirîya konferansa jinan ya neteweyî ya Kurdistanê û kar û xebatên komisyonê hatin gotûbêj kirin.

Wekî tete zanîn, ev çend meh in ku hazirîyên konferansê tene domandin. Hem li çar parçeyan, hem jî li Ewrûpayê çend komisyonên cuda hatine danan.

Biryar hebû ku di bin navê "Jin û şiddet" da konferans bête kirin ku li ser pirsgerêkên giştî yê jinan bête rawestan.

Bi vê armancê projeyek hatîye hazir kirin û pêşkêşî sazîyên têkildar yê Ewrûpayê hatîye kirin.

Lê belê, îro rewşa polîtîk ya navçeyê û hessasîyeta zêde ya hukûmeta Kurdistan Federal tete dîtin. Lewma, konferans di bin navê "jin û şiddet" da bête çêkirin, dê digel xwe hindek zehmetîyan hetta astengan bîne. Ji ber vê endîşeyê konferans di bin navê "Jin û demokrasi" da bête çêkirin dê di rê datir be. Li ser vê yêkê taslaxek hate hazir kirin û ji derdorên cuda ra hate şandin. Li ser vê yêkê herçend desteka xwe kiviş kirin jî, belê hêj ne zelal e ku ev desteke dê bi çi rengî be.

Pêşniyara hevalên li jêr ew e ku konferans li meha Nîsanê çêbe, belê encama ku ji kombûna me derketî ew e ku ev dem gelekî zû ye û hazirî hêj ne di sewîyeya besîyê da ne.

Çiku projeya hatîye hazir kirin ku desteka malî werbigire, divêt bête guhorîn. Lê heke em bi xwe vê pirsê çareser bikin, hingê asteng namîne.

Ji bo vê yêkê jî biryar hate standin ku digel hevalên li navçeyê têkilî bête danan ku çareserîyek bête dîtin. Di vê manayê da xebata konferansê dewam dike û têkilîyên digel kesên ku dê bêne vexwandin dê bêne domandin. Piştî ku hazirî timam bûn, ji bo medyayê jî dê amadekarîyek bête kirin. Biryar hate wergirtin ku xebatkarên li Ewrûpayê bi vê yêkê ve mijûl bin.

Li ser xala duyemîn ya rojevê jî em dikarin vê bêjin: Komisyon karê xwe dike, belê jî ber ku her endamê komisyonê karekî dî jî dike, di pratîkê da hindek zehmetî derdikevin pêş.

Lê belê, li ser vê yêkê dubare hate gotin ku hevalên rêvebirîyê divêt di nav têkilîyêke bi koordînetir da bin.

Li mile dî, hate gotin ku carna hindek pirsgerêkên teknîkî jî dibine sebebê zehmetîyan. Dîsa hate destnîşan kirin ku di roj û aktîvîyeyên plankirî da, bi navê komisyonê belavok û daxuyanî tene dan û belav kirin, lê eve bes nînin û divêt ji nihe û pêve hessastir bin.

Di encam da, beşdaran bi vekirî beyan kirin ku divêt zêdetir giranîyê bidine xebatê.

Di dawîyê da kotaya Ewrûpayê ya ji bo konferansê hate kiviş kirin. Li Ewrûpayê bi şertê ji her sazî û komika xebatê temsîl hebe, beşdarîya 7 kesan bes hatîye dîtin. Herweha di rê da hatîye dîtin ku hîlbijartina li ser vê yêkê di destê sazîyan da be.

Digel rêz û silavan.

Komisyona Jinan ya KNKyê

13 Sibate 2008

Li ser êrişê 21ê Sibate, daxuyanîya Konseya Rêvebir ya KNKyê ji bo medyayê

Dewleta Tirk ev mehek e dijî Warên Parastinê yê Medyayê êrişên hewayî bi berfirahî dayne dest pê kirin. Di bombardumanên ji 16ê Kanûna 2007ê were, gelek navçeyên başûra Kurdistanê hatine kaviş kirin, zerar û zîyaneke mezin hatîye dan û mirovên sivil hatine kuştin.

Ertêşa Tirk bi êrişên hewayî nema, ji duhî [21 Sibate 2008] were jî ber bi başûra Kurdistanê ve êrişeke reşahîyê ya dagîrîyê jî daye dest pê kirin. Ev êrişê dagîrkirina başûra Kurdistanê ye. Ev dagîrîya dewleta Tirk hem dijî huqûqa navneteweyî ye, hem jî sucekî mirovî ye. Ev êrişên dewleta Tirk ya ku hebûna xelkê Kurd inkar dike û hukûmeta AKPyê bi çu rengî nayên qebûl kirin û pêkve ne meşrû ye û êrişeke dijî mirovî ye.

Xelkê Kurd ji nav prosesêke giring derbaz dibe. Ev êrişê dagîrîyê ya ku dewlet û hukûmeta Tirk daye dest pê kirin, ji bo berjewendîyên hemû Kurdan tehlikeyeke micid e. Dewleta Tirk hemû bihayên ku bi xebat û têkoşîna dehan salan ya bizava neteweyî ve hatine bi destxistin, kirine armanca têkbinê.

Ev êrişên ertêşa Tirk beramberî hemû xelkê Kurd hatîye kirin. Pêdivî ye ku dijî van êrişên hemû Kurd bi hev ra rawestin. Di serî da hêzên başûra Kurdistanê û hemû Kurd, dijî vê dagîrîya ertêşa Tirk divêt hemû hêza xwe bi kar binin. Em wekî Kongreya Neteweyî ya Kurdistanê [KNK], li ser vê yêkê bangî xelkê Kurd dikin ku seferber bibin. Dijî van êrişên dagîrker û birandêr, her li kî derê be bila bibe, çu Kurd divêt bêdeng nemînin. Hem li welat, hem jî li derveyî welat divêt Kurd pêkve rabin ser pêya û vî rûyê dagîrker yê dewleta Tirk aşkera bikin

Çi dibe bila bibe, çu hêz û qudret nikare bihayên ku xelkê Kurd qazanc kirî, bînpê bike. Xelkê Kurd dê li bihayên xwe xwudan derkeve.

Konseya Rêvebir ya KNKyê

22 Sibat 2008

Daxuyanîya Konseya Rêvebir ya KNKyê

Konseya Rêvebir ya KNKyê di 8ê Adarê, roja "Jinên kedkar yên cîhanê" da kom bû. Bi vê munasebetê her di serî da, konseya rêvebir bihayekî mezin da xebat û têkoşîna jinên kedkar yên Kurd û hemû cîhanê û ev roja bihadar li hemû jinên Kurd û yên cîhanê pîroz kir. Jinên Kurd pêkve kedkar in û di bin zulmeke nedîtî da ne. KNK, zordestîya li ser jinên Kurd ya li mal, li derve, li kar rûreş û şermizar dîke û piştgirîya herî mezin nîşanî jinan dide. Jina Kurd, bi cihgirtina li nav refên şoreşa Kurdistanê ya leşkerî û polîtîk xwe jî mezin kirîye, pêkve xelkê Kurd jî serbilind kirîye. KNK jî ber vê fedakarî û cesareta mezin, jina Kurd hêjayî hemû meth û senaya dibîne û pîroz dîke.

Konseya rêvebir, pêşhatinên dawîyê bi berfirehî riberiz kirin û bihayekî mezin da serhildana xelkê Kurd ya sivîl û berxwedana herî mezin ya gerîlayên HPGyê. KNK pêkve silava herî mezin dide têkoşîna xelkê Kurd û gerîlayan û wan pîroz dîke. Neteweyê Kurd, bi gerîlayên HPGyê, ku di berxwedana "şerê heşt rojî yê Gelîyê Zê" da destan nivîsîn, gelekî serbilind e.

Di şerê dawîyê da bi zelalî hate dîtin ku dewleta Tirk binket, hêza gerîla û bizava neteweyî serket. Bi navê xelkê Kurd, wekî hêza pêşeng, PKK û hêza gerîla HPGyê, di pratîkê da "îsbatî ruşd" kirin û careke dî dane kîvş kirin ku beramberî dewleta Tirk temsîla neteweyê Kurd û Kurdistanê dikin. Dewleta Tirk digel hemû hevkarî û desteka tifaqdarên xwe jî nikarî bigihe armanca xwe û şkestekê mezin xwar. KNK gelek bi micidahî bala dewleta Tirk û hemû tifaqdarên wê dikêşe ku, di şer û êrişkarîyê da îsrar nekin û zêdetir xwûnê nerêjin, ji ber ku ew bi çu awayî nikarin di warê leşkerî da serkevtinê bi dest ve binin. KNK li ber vê tabloyê bangî dewleta Tirk û tifaqdarên wê

dîke ku rojek zûtir diyalogê digel PKKyê danin û rê li ber çareserîyeke maqûl vekin. Bizava neteweyî ya xelkê Kurd hem ji aliyê polîtîk û rêxistinî ve, hem jî ji aliyê leşkerî ve muktedîrê her cure xebat û têkoşînê ye. Di serî da dewleta Tirk û pêkve tifaqdarên wê bila pozîsyona xwe li goreyî vê rastîyê werbigirin. Bi navê xelkê Kurd, PKK û HPG amadeyî hemû rêyên diyalog û çareserîyê ne û ev şiyana xwe di pratîka hinde salan da nîşan dane. KNK di proseseke hinde dijwar û aloz da hazir e ku roleke çêker bileyize di navbeyna terefan da.

Konseya rêvebir herweha li ser rewşa saxîya rêberê KCKyê Abdullah Ocalan jî rawesta. Rapora CPTyê jî kîvş kir ku endîşeya xelkê Kurd ya di derheqê saxîya Abdullah Ocalan da çend rast û heq bûye. Piştî aşkerakirina rapora CPTyê, KNK wekî her demî, pêşîyê bangî xelkê Kurd dîke ku xebat û têkoşîna parastîna Ocalan sist nekin, geştir û mezintir bikin. KNK jî bo agahdarkirina li ser rewşa Abdullah Ocalan dê nameyan bo organîzasyonên navneteweyî bişîne.

KNK di bîst salîya salvegera jenosîda Helepeçyê da, careke dî kirdaran rûreş dîke û hêvî dîke ku xelkê Kurd vê bûyera reş ji bîr neke û nede ji bîr kirin. KNK herweha bangî hukûmeta Kurdistanê Federal jî dîke ku hevkarîya xelkê Helepeçe bi rengêkî daîm bête kirin.

Konseya rêvebir bi baldarî li ser hatina Newrozê jî sekinî û ji nihe ve bangî xelkê Kurd dîke ku li seranserê Kurdistanê û hemû meydanên diasporayê hazirîyeke rêkûpêk bikin ji bo pîrozîya cejna Newrozê. Newroza îsal divêt bibe silavdaneke mezin ji bo têkoşîn û berxwedana gerîlayên HPGyê. KNK jî îro ve, Newroza neteweyê Kurd pîroz dîke.

KNK wekî her car, rojên îro ji bo hevgirtin û tifaqa neteweyî gelek gihiştî dibîne. Ev rastîye di mîdehê dagîrîya dewleta Tirk ya li ser parçeyê başûr da jî hate dîtin. Gerîlayên Hêzên Parastîna Gel, dijî ertêşa Tirk hem bakur, hem jî başûr parastin. Xelkê me yê başûr jî, ji gund heta bajêr û dibistan û zanîngehan piştevanîyeke xurt nîşanî berxwedana gerîla dan. Ji ber ku xelkê me baş tîgîhişt ku êrişên ertêşa Tirk armanca xwe kirîye hem şkandîna PKKyê, hem jî tengavkirina destkefta Kurdistanê Federal. KNK vê berxwedana parastîna Kurdistanê û piştevanîya xelkê Kurd ji bo pêkînan tifaqa navxweyî nimûneyeke gelek pozîtîv dibîne û bangî hemû kesayet û rêxistinên Kurd dîke ku vê pêşhatina di warê hevgirtinê da biparêzin û bikine bingehe avakirina yêkîtiya neteweyî. Divêt beramberî êrişkarîya dewleta Tirk û tifaqdarên wê û pêkve dewletên kolonyalist û dagîrker, cepheyekî herî fireh yê neteweyî bête vehûnandin.

Serkevtin ya neteweyê Kurd û Kurdistanê ye.

Konseya Rêvebir ya KNKyê

8 Adar 2008, Bruksel

Not:

Serokê PJAKê Hacî Ehmedî û serokê PÇDKyê Dr. Faîk Gulpî jî beşdarî kombûna konseya rêvebir ya 8ê Adarê bûn. Hacî Ehmedî, li ser xebat û têkoşîna partîya xwe ya

dijî rejîma Ayetullahan ya Îranê agahîyên berfireh dan û ji KNKYê û timamî xelkê Kurd xwast ku hevkarî û piştevaniya bizava neteweyî ya li rojhilat bikin. Dr. Gulpî jî herwisa li ser xebata partîya xwe agahîyên berfireh dan. Dr. Gulpî digel pêşhatinên pozîtîv yê li Kurdistanê Federal, herweha behsê bûn û bûyerên negatîv jî kir û polîtîka hukûmeta Kurdistanê rexne kir. Serokê PJAKê Hacî Ehmedî û serokê PÇDKyê Dr. Faik Gulpî bi giringî li ser yêkitîya hêzên neteweyî jî rawestan û bi taybetî Dr. Gulpî bang li berpirsiyarên Kurdistanê Federal kir ku dawî li zordestîya li ser partîya wan binin û rê li ber avakirina demokrasîyê xweş bikin.

Nameya KNKYê bo serokan:

Konseya Rêvebir ya KNKYê, di kombûna xwe ya 8ê Adarê da biryar da ku li ser rewşa Ocalan nameyekê bo Yêkitîya Ewrûpayê [YE], bo serok dewlet û serok wezîran û herweha bo organîzasyonên xêrxwaz û humanîter bişînin. Name bo Ingilîzî hate tercume kirin û hate şandin. Li jêr nameyê didin.

**Birêz Janez Janša,
Serokê EUyê û Serok Wezîrê Slovenyayê**

Em wekî organîzasyonêke sosyopolîtîk û sosyokulturel ya sihwane ya Kurdistanê, dixwazin li ser rewşa girtîyê polîtîk birêz Abdullah Ocalan agahîyê bidin û daxwaza destekê ji we bikin. Abdullah Ocalan serokê PKK û rêberê KCKyê ye. Ji 15ê Sibata 1999ê were di girtîxaneyê giravê Imralî da li Tirkîyeyê, girtîyekî polîtîk e û hukmê mûbetê lê hatîye birîn. Ocalan di wî giravê da bi tinê tete girtin. Girtîxaneyê Imralîyê bi timamî di bin kontrola leşkerî da ye. Çu norm û rêzîkên girtîxaneyên sivîl li wê derê bi kar nayên. Girtîxaneyêke taybetî ye û dûrî şertên normalîyê ye. Abdullah Ocalan li wê girtîxaneyê li girave Imraliyê di nav şertên nesihî da tete girtin. Îzolasyonêke gelek bêtixûb tete tetbîq kirin li ser wî. Hewcehiyên wî yê sosyolîk û kulturî nayên dîtin. Şert û îmkânên sporê nayên dan. Van şertên gelek zor û negatîv li ser saxîya wî dîrekt tesîreke xirab kirîye. Ji ber vê nebaşîya saxîya wî, awûkatên wî li ser çend mûyên pora wî tehlîl dane kirin û encama vê tehlîlê 1ê Adara 2007ê li serbijêrê Italya Romayê bi preskonferansêke aşkera kirin û li goreyî vê daxuyanîyê derkete meydanê ku Ocalan ji teref dewleta Tirk ve bi sîstematîkî tete jahîrî dan. Li ser vê bûyera jahîrdanê xelkê Kurd reaksiyoneke mezin nîşan da û ji hêzên navneteweyî yê humanîter xwast ku bi rewşa Ocalan ve mijûl bin. Li ser vê xwasteka xelkê Kurd delegasyonêke CPTyê [Committee for the Prevention of Torture – Komîteya nehêlana îşkenceyê] çû Îmralîyê û di midehê du rojan da [19 – 22 Gulan 2007] Ocalan muayene kirin û raporek

jî nivîsîn. Bi gelek direngî jî be CPTyê rapora xwe 6ê Adara 2008ê aşkera kir. Di raporê da tesbîten giring hene ku teyîda endîşeyên xelkê Kurd dikin. Rapora CPTyê herweha destnîşan kir ku li ser Ocalan îzolasyonêke nedîtî ya sosyolîk heye û eve tesîreke mezin ya negatîv li ser psîkolojîya wî dike. CPTyê tewsiye li hukûmeta Tirk kirîye ku rewşa Ocalan bête baş kirin û ji bo girtîxaneyêke sivîl bête neqil kirin. Lê belê, hukûmeta Tirk demildest ev rapora CPTyê û tewsiyeyên wan red kirin.

Vêca rewşa Ocalan bi kurtî û konkretî ev e. Em endîşeya neteweyê Kurd ya di derheqê saxîya Ocalan da parve dikin. Wekî di tehlîlên CPTyê da jî hatîye kivş kirin, heke zûtîrîn dem rewşa Ocalan neyête baş kirin û li goreyî tewsiyeyên CPTyê neyête hereket kirin, saxîya Ocalan dê ber bi xeterîyêke mezin ve biçê. Xelkê Kurd di nav alarmê da ye û li hêviyê ye ku esasên Ocalan bête berdan, lê belê, eve nebe jî, bo girtîxaneyêke sivîl bête neqil kirin û li xestexaneyêke mezin û tam teşkîlat da bête muayene kirin û tedawîya wî bête kirin. Em wekî KNK ji we tika dikin ku li ser vê pirsê rawestin, nûfûz û tesîra xwe bi kar binin û hevkarîyê bikin. Em li hêviya destek û agahdarîya we ne.

Digel rêz û silavên me.

**Konseya rêvebir ya KNKYê
16 Adar 2008, Bruksel**

[Bo serokên dewlet û hukûmetan û organîzasyonên navneteweyî jî hatîye şandin.]

Not:

Name ji bo serokwezîrê Slovenyayê hate şandin ku Slovenya ji serê sala 2008ê heta dawîya Hezîrana 2008ê seroka Yêkitîya Ewrûpayê [YE] ye. Berpirsiyara ofîsa serokwezîr name ji bo ku li ser bête rawestan, bi agahdarîyêke kurt, şande wezareta karê derve ya hukûmeta xwe û nimûneyek ji wê namekê jî bo KNKYê şand. Li jêr wê “talîmata” serokwezaretê jî didin.

**Komara Slovenya
Ofîsa Serokwezîr**

No: 511-3/2008
18ê Adarê 2008

Bo
Wezareta Karê Derve
Ofîsa Wezîr
gp.mzz@gov.si

Mijar: Girtîyê polîtîk Abdullah Ocalan

Birêzan,

Buroya serokwezîr nameyek ji Konseya Rêvebir ya Kongreya Neteweyî ya Kurdistanê wergirt. Di nameyê da ji serokwezîr Janez Jansa, ku wekî serokê YEyê ye, tete

xwastin ku rewşa girtîyê polîtîk birêz Abdullah Ocalan di ber çavan ra bête derbaz kirin. Birêz Abdullah Ocalan li girtixaneyê di giravê Imraliyê da girtîyekî bi tinê ye û cizayê mubbetê dikêşe.

Di nameyê da li ser rewşa xirab ya wî û bi taybetî li ser îzolasyona mezin ya sosyal û qebûlnekirina tewsiyeyên CPTyê ji teref hukûmeta Tirkîyeyê tete behs kirin.

Xwasteka me ew e ku hûn vê serlêdanê analîz bikin û li goreyî wê hareket bikin.

Spas ji bo bi hev ra karkirina we.

Digel rêz û silavan.

Nika Dolinar Divjak,
Seroka Ofisa Serokwezîr

Newroz vejîn e

Newroz wekî sembola vejînê, herwisa sembola serhildana dijî zulmê ye jî. Kurd Newrozê wekî cejna yekitîya neteweyî jî pîroz dikin.

Serhildana serkevtî ya xelkê Kurd ya berî hizaran sal ya di pêşengîya Kawa da li dijî Dehaqê zalim, ji 1982ê were jî bi giyanê têkoşerîya Kawayê hevdem Mazlûm Doxan ya li „Hefsa Diyarbekirê“ didome.

Serhildana Kawayê hevdem, bûye nişana berxwedana dijî barbarîya hêzên kolonyalist û faşîst. Agirê Newrozê yê ku Mazlûm li „Hefsa Diyarbekirê“ dubare vexistî, di roja me da gurtir bûye û li dora xwe xelekên mezintir yê berxwedanê pêkîname. Xwezîya wî xelkî ku xwudanê lawên wisa ye.

Di salvegera Newroza hizaran salî da, di serî da Mazlûm Doxan û Bêrîvan, Ronahî, Zekîye, Rahşan û hemû şehîdên xwe, em bi rêz û vîn bi bîr tînin. Wekî hercar em dibêjin, îro jî şehîdên me bihayên me yê mezînin in û ew honura me ne. Em wan her dem û li her derê bi minet bi bîr tînin û dê bînin.

Xelkê Kurd hersal cejna Newrozê bi bawerîyeke xurt ya bi giyanê şehîdan ve girêdayî pîroz dike. Heke giringîya vê sala 2008ê li ber çavan bête girtin, Newroza îsal dê bi giyanekî berxwedêr û yekitîxwaz, li her derê bi çoşeke mezin bête pîroz kirin. Agirê Newrozê dê geş û gurtir be û bibe hêvîya azadîya xelkan.

Di roja îro da, zulma Dehaqê zalim bi rengên cuda dom dike. Bawerîya me heroj xurttir dibe ku hemû hêzên neteweyî yê xelkê Kurd dê hêza xwe ya yekgirtî dijî vê zulmê seferber bikin.

Em bangî hemû Kurdan dikin ku dijî van polîtîkên

dijminane, bi giyanê yekgirtî yê neteweyî têkoşîna xwe bilindtir bikin. Divêt agirê gur yê Newrozê yê azadîyê, çu caran netemire û bila bibe ronahîya welatê me Kurdistanê û hemû Rojhilatanavîn.

Em wekî Kongreya Neteweyî ya Kurdistanê [KNK], vê cejna mezin û manadar, di serî da li xelkê Kurd û hemû xelkên Rojhilatanavîn pîroz dikin.

Konseya Rêvebir ya KNKyê
20 Adar 2008

Ji jinan pîrozbahîya Newrozê

Gelê me yê hêja!

Em di destpêkê da cejna Newrozê, bi ruha berxwedan û bi biryara têkoşînê li we pîroz dikin.

Herwekî tete zanîn meha Adarê di diroka gelê me da wekî meheke serhildan û egîdfiyê tete nas kirin. Herçiqas Newroz cejneke jî, lê ji bo gelê me zêdetir manaya vejîn û têkoşîna azadîyê wergirtîye. Ji ber vê yekê, Newroz jî di vê manayê da tete pîroz kirin. Bi taybetî ev sala ku em teta ne, saleke ji her demî zêdetir xwudanê vê manayê ye. Ji ber ku di milekê da êrişên dijminê gelê me zêdetir bûne, ji aliyê dî jî pirsgerêka gelê me ji her demî zêdetir ketîye rojeva dinyayê û van pêşketinan bi xwe ra gelek destkevtên bihadar jî inane.

Le belê, di vî demê weha giring da hewce ye em zêdetir hişyar bin û zêdetir bi têkoşîna xwe ra bin. Careke dî aşkera bû ku kolonyalîstan dinya hilgirtin pişt xwe û êriş birin ser başûr. Gelê me baş dizane ku li hemberî erîşên dijminê me, lehengên gelê me yê li serê çîya berxwedan û egîdfiyek mezin nişan dan. Rast e vê berxwedan û egîdfiyê, dewleta Tirk di hêla eskerî û moral da şikand, lê rastîyek dî jî derkete meydanê ku yekitîya me ya neteweyî hêza herî mezin e û herî zêde jî hewcehîya me bi yekitîyê heye. Em dikarin bêjin ku encama herî giring ku ji manaya Newrozê bête girtin jî eve ye.

Dijminên me yê ku hene, di Helepçeyê da û di Qamişlo da xwastin gelê me nîne bikin û bi gelek reng erîşên gemar û qirêj xwastin gelê me parçe bikin. Ev yêke di bin navên herêmî, dînî û bi tixûbên ji têtê hatine danan kirin. Herî dawîyê, di erîşa başûr da careke dî xwastin ku Kurdan bi Kurdan bidin kuştin û careke dî şerê navxweyî bidin dubare kirin. Lê cihê şahîyê ye ku bi ser neketin. Helwesta Amedê û Bamernê bi hev ra bû yek û nîyeta dijminên me vala derxistin.

Di encam da; em wekî jinên Kurd, ji herdemî zêdetir, bi zanîn û têngiştina yekitîya neteweyî û têkoşîna demokratîk dê hereket bikin. Û daku careke dî xemên giran yê wekî Helepçeyê neyên jîyan û careke dî zarokên gelê me neyên qir kirin û bindest kirin, em dê bitêkoşin û di vê têkoşîna

gelê me da em hergav dê mil bi milê gelê xwe bin.
Di dawîyê da, banga me bo timamî gelê me û bi taybetî
jî ji jina Kurd ew e ku di xeta azadîyê da bibin yêk. Bi
munasebeta vê roja pîroz ya Newrozê, em hêvîdar in ku ji
her demî baştir dê li bihayên xwe xwudan derkevin.

Komisyona Jinan ya KNKyê

17 Adar 2008

**

*„... KNK wekî her car, rojên îro
ji bo hevgirtin û tifaqa neteweyî
gelek ghişti dibîne. Ev rastîye di
midehê dagîrîya dewleta Tirk ya li
ser parçeyê başûr da jî hate dîtin.
Gerîlayên Hêzên Parastina Gel,
dijî ertêşa Tirk hem bakur, hem jî
başûr parastin. Xelkê me yê başûr
jî, ji gund heta bajêr û dibistan
û zanîngehan piştevanîyeke xurt
nîşanî berxwedana gerîla dan. Ji
ber ku xelkê me baş têgihîşt ku
êrişa ertêşa Tirk armanca xwe
kirîye hem şkandina PKKyê, hem jî
tengavkirina destkevtî Kurdistan
Federal. KNK vê berxwedana
parastina Kurdistanê û piştevanîya
xelkê Kurd ji bo pêkînanana tifaqa
navxweyî nimûneyeke gelek
pozîtîv dibîne û bangî hemû
kesayet û rêxistinên Kurd dike ku
vê pêşhatina di warê hevgirtinê
da biparêzin û bikine bingehê
avakirina yekîtîya neteweyî...“*

**Ji daxuyanîya Konseya Rêvebir ya KNKyê
8 Adar 2008, Bruksel**

Berhevokek ji notên hevdîtina “Rêberê KCKyê Ocalan” ya digel awûkatan

Ji Ocalan:

Dikarin Kongreya Civata Demokratîk pêkbînin

“... Pêşniyara min ji bo Kurdistanê, pêkhatina Medenîyeta Demokratîk e... Dikarin Kongreya Civata Demokratîk pêkbînin, başe. Bila gelek kombûnan bikin, têkoşîna xwe ya demokratîk xurt bikin. Ji xwe eve ne dijî qanûnan e. Armanca dewletbûnê û cûdabûnê nîne. Min berê li ser vê yêkê jî analîzek kiribû. Daxwaza min ev e; bila vî karî micid [ciddî] bigirin. Bila bo xwe cihekî mezin bi dest bêxin. Ji bo paşerojê bêyî rawestan bixebitin. Bila akademîya polîtîk û demokrasîyê danin. Bila bi sedan, hizaran polîtîkeran bigihînin. Dikarin koordînasyonê mayînde û domdirêj pêkbînin. Heke pênc sed kes hatin girtin, divêt pênc sed kes bêne amade kirin ku cihê wan bigirin. Hetta cihê yê çûyî divêt bi zêdehî ve bête tijî kirin. Bi vî rengî dikarin têkoşîna xwe bidomînin...” [Ji hevdîtina 14ê Sibata 2008ê]

**

Ez dê berxwedana xwe bidomînim

“... Ez ji bo azadîya xelkê Kurd li vê derê me. Divêt rejîma Imralîyê baş bête têgihîştin. Rejîma Imralîyê bi min ve girêdayî nîne, bi tesfîyeya azadîya xelkê Kurd ve girêdayîye...”

Çu paketên AKPyê nînin û Erdogan nikare Kurdan bi pakêtan bilêhbîne

“... Hukûmet jî êdî ne hukûmet e, îradeya wê nîne. Li şûna çareserîyê operasyona dikin. Min gelek caran gotîye ku operasyon bi ser nakevin û çareserîyê naynin. Tirkîye vê gavê di nav kêşmekêşê da ye û kes nizane çî dike... AKPyê çu çareserî jî nîne, pakêten wê jî nînin... Bi taybetî eve bîst sal in ku Kurdan mehkûmî bîrsîtyê dikin. Serokwezîr Erdogan îro dibêje ku ew dê bi serfa 12 milyar dolaran terorê xilas bikin. Min guhardîya serokkomar Gul jî kir, ew jî eynî tiştî dibêje...”

“... Ez bangî Erdogan dikim, hûn nikarin bi vî rengî ”terorê” xilas bikin, tinê dikarin ”terorê” tehrîk bikin. Dibêje, ”ez dê makzîmanî serbest bikim, kanalekî televîzyonê vekim”. Tu kî yî ku di derheqê zîmanî da

biryarê didî? Heştê salan dê vî zimanî qedexê bikî, paşê jî min biryar da dê bêjî. Ev zimane berî te jî hebû, dê piştî te jî hebe. Dê kanalekî televîzyonê bide Kurdan!. Kurdan ji xwe kanalê televîzyonê heye. Kes ne zarok e û nikarî kesê bi vî rengî jî bilêhbînî. Herwekî ku zarokekî sava bilêhbînî, ez dê nizamî pakêtekê vekim, filan bikim, bêhvan bikim, bi okûs pokûsan dixwazin Kurdan bilêhbînî. Timam, ez jî dizanim ku gelek kes hene ku xwe bi meaşekê teslîm bikin, belê Kurd vê yêkê qebûl nakin. Kurd mirîyê namûsa xwe ne. Kurdan çil hizxar şehîd hene û her yêk ji wan abîdeyek e. Vê pîrsê nikarin bi vî rengî çareser bikin...” [Ji ANF, 14ê Adara 2008ê]

Bila Erdogan û Gul digel min di nav dîyalogê da bin

”... Pêşîya me bihar e. Ev pîrse ciddî ye û ji Erdogan dibore. Ez bangî Jandarmê, Mudûrîyeta Giştî ya Emnîyetê, dewletê, hukûmetê dikim, çareserîyeke demokratîk mumkun e. Ez ji birêz Erdogan û birêz Gul tikayê dikim, dikarin mil bidine çareserîya demokratîk û dikarin dîyalogê digel min danin. Talabanî û Barzanî jî dikarin mil bidine çareserîyeke demokratîk...” [Ji ANF, 14 Adar 2008]

**

Ocalan: Li ser pîrsa Kurdî dê wekî ya Kosovayê bête rawestan!

”Pîrsa Kurdî bûye pîrseke navneteweyî. Wekî Kosova, Qibris, Filistîn û hetta ji wan jî li pêştir û mezintir pîrseke navneteweyî ye.. Li ser vê pîrse, êdî dê wekî wan bête rawestan.”

Pakêta AKPyê pakêta şer e

”... Pakêta ekonomîk, şerê ekonomîk e, pakêta polîtîk, şerê polîtîk e, pakêta psikolojîk, şerê psikolojîk e. Ewe şerê ekonomîk, şerê polîtîk, şerê psikolojîk dikin. Bi pakêta psikolojîk ertêşa pênc sed hizarî diajon ser Kurdan. AKP vê pîrsê dê bi ertêşê û polîs çareser bike?...”
”... Ewe lêhbandinên mezin in.”

Bo çar parçeyan Kurdistanê Azad

”... Bo Kurdan lihevhatina Medenîyeta Demokratîk dibêjim. Bo min, ”dev ji serxwebûnê berdaye” dibêjin. Di roja me da çu welatên bi timamî serbixwe nînin. Ji ber vê yêkê behsê azadîyê dikim. Tixûbên welaî qebûl dikim. Min netewe-dewlet li paş xwe hêla. Ez behsê lihevhatina medenîyetan dikim. Wekî Bakunî dewletê jî red nakim. Dewlet divê di xizmeta xelkê da be, demokratîk be û ber bi vê yêkê ve tekamul bibe. Ez dewletê ji nû ve bi nav dikim. Ez behsê gotina qelp ya weta nakim behsê welaî dikim. Gotina serxwebûnê gelek hate guhorîn. Êdî çu welat bi timamî ne serbixwe ne. Tarz û dereceya têkilîyên

dewletan gelek hatîye guhorîn. Ji ber hindê gotina Kurdistanê Azad rasttir e. Ji bo çar parçeyan Kurdistanê Azad dibêjim.”

Divêt polîtîka demokratîk fêrbîn

”... Herkes dizane ez li vê derê çî diaxivim, dewlet jî dizane. Ez dibêjim polîtîka demokratîk giring e. Ewe ji bo rê li ber birîna şerê Kurd û Tirk, karekî jîyanî ye. Belê ez dibêjim bila polîtîka demokratîk bête kirin, bila derî li ber polîtîka demokratîk bête vekirin, ewe ne ferman e. Polîtîka demokratîk, ji bo rê li ber şer birînê, bo çareserîyeke demokratîk hewce ye. Herkes divêt polîtîka demokratîk baş fêrbibe, baş têbigihe. Ji bo çareserîyeke demokratîk, bo rê li ber şerê Kurd û Tirk birînê, divêt hunera polîtîkê bi hostahî bête bi kar înan. Gelo ew li şûna polîtîka demokratîk şerî dixwazin? Ji xwe ertêşa pênc sed hizarî diajon ser Kurdan. Heroj şer, vê dixwazin? Dijî van daxwazan ez dibêjim divêt xwudanên van daxwazan jî polîtîka demokratîk fêrbîn, divêt herkes fêrî polîtîka demokratîk bibe.”

[Ji ajansa ANF, 23 Adar 2008] - Kurdîya notan: RH

**

**”... Pîrsa Kurdî bûye
pîrseke navneteweyî.
Wekî Kosova, Qibris,
Filistîn û hetta ji wan
jî li pêştir û mezintir
pîrseke navneteweyî
ye.. Li ser vê pîrse,
êdî dê wekî wan bête
rawestan...”**

Abdullah Ocalan

**

Biryara Kongreya Civata Demokratîk ya li Amedê: Kurdistana Otonom ya Demokratîk

Piştî Kongreya Civata Demokratîk, beşdarên kongreyê digel hizaran xelkî, bi mitîngeke boş êriş û noperasyonên ertêşa Tirk protesto kirin. Di wê mitîngê da Leylala Zanayê, daxuyanîya encamê ya Kongreya Civata Demokratîk xwand. Di wê daxuyanîyê da xalên giring hebûn. Daxuyanî wekî nûçe di çapemenîyê da cih girt. Birek ji wê nûçeya di rojnameya "Yeni Özgür Politika"yê da bi Tirkî hatîye weşandin, Kurdîya wê li jêr didin.

Leylala Zanayê daxuyanîya Kongreya Civata Demokratîk ya yêkemin aşkera kir û got ku ji bo çareserîyeke herî maqûl, rêya herî hevdem û di xêra xelkan da "Kurdistana Otonom ya Demokratîk" e.

Zanayê kivş kir ku Kongreyê hemû operasyon bi nefret şermizar kirine. Zanayê herwisa da zanîn ku dijî van operasyonê wezîfeya herî bingehîn ew e ku bi giyanekî seferberîyê berxwedana demokratîk vehûnin ku eve erkekî jîyanî yê xelkê me ye.

Banga berxwedana meşrû

Zanayê bangî lîderên Kurd Barzanîn û Talabanî jî kir û got ku di serî da hêzên başûrî, herkesê ku xwe Kurd dizane, divêt bikevine nav berxwedaneke meşrû. Zanayê destnîşan kir ku operasyonê li ser axa Kurdistana Federal "dagîrî" ye. Zanayê got ku "Ez silavan li xelkê me yê ku rê li ber tankan girtî, dikim û hevî dikim ku ev reftare ji bo hemû xelkê me yê li başûr bibe nimûne..."

Hejmara şehridarîyan divêt bibe du qat

"... Hemû kadro û xelkê me yê welatparêz divêt bi bîr û berpirsiyarîya civakî û demokratîk û ji hemû reftarên teng û ferdî dûr, xwe hazîrî hilbijartinên şehridarîyê bikin. Yêk ji armancên kombûna me jî ew e ku di hilbijartinên pêşîya me da divêt şehridarîyên heyî bibine du qat..."
[26 Sibat 2008 / Ji YÖPê]

„Di roja '14ê Gulanê, Cejna Zimanê Kurdî' da, 'Konferansa Zimanê Kurdî' li Berlînê kom dibe.“

Biryarên KNKYê:

Biryara "Komisyona Ziman û Perwerdeyê ya KNKYê":

Bi biryara komisyonê, digel Instîtuta Kurdî li Elmanya, di roja "14ê Gulanê, Cejna Zimanê Kurdî" da, "Konferansa Zimanê Kurdî" dê bête kom kirin. Konferans dê li Berlînê be û du roj in: 14 – 15ê Gulanê. Konferans, roja ewil dê bi pîrozîya "Cejna Zimane Kurdî" dest pê bike.

Biryara "Komisyona Jinan ya KNKYê":

Di nav demsala havînê da, "Konferansa Jinên Kurdistanê" dê li Hewlerê bête kom kirin.

Biryara "Komisyona Neteweyî ya KNKYê":

Rêzekombûnên digel ronakbîr û şexsîyetên polîtîk yê serbixwe yê Kurd, dê bêne domandin.

Biryara "Konseya Rêvebir ya KNKYê":

Hazîrîya komkirina "kombûna mezin" [kongre] ya salane ya KNKYê dê bête kirin. Kombûna mezin dê di nav meha Hezîranê da bête kirin. Biryarên komisyonan hatine erê kirin. [8 Adar 2008]

Serkevtina Geliye Zê *

"... Bi navê xelkê Kurd, heza gerîla, HPG, bi berxwedaneke xurt çeperên dijmin hind dide zorê ku ev ertêşa hinde bi nav û deng ya dewleta Tirk û Natoyê nikare xwe li ber bigire. Şer li ber û pişt û rex û rûyên Geliyê Zê berdewam e. Geliyê Zê bûye sentrala şerê man û nemanê. Geliyê Zê ji bilî cihê pratîka şer, êdî bûye sembol jî bo herdu çeperan. Ertêşa dagîrker ji bo serkevtinîya xwe mangêhên gerîla yê li Geliyê Zê kirine armanca vegirtinê! Belê HPGyê jî Geliyê Zê bo xwe kirîye simbola serkevtinê..."
"... Geliyê Zê, ji bo bizava neteweyî ya xelkê Kurd û şerê dijî dagîrkerîya dewleta Tirk, çeperê "Dien Bien Fu"ya Vîetnamê ye. Xelkê Vîetname çawa 7ê Gulana 1954ê pişt ertêşa Fransa li Dien Bien Fuyê şkand û dergehê serkevtina Vîetname ji bakur ve vekir, Geliyê Zê jî dê

wisa be. Ertêşa Tirk di Geliye Zê da rastî hezîmeteke mezin hatîye. Hezîmeta ertêşa Fransa çawa bû li Dien Bien Fuya Vîetnamê, hezîmeta ertêşa Tirk jî li Geliyê Zê dê wisa be...”

“...Hem êxistina Helîkopteran, hem zeyîata canî ya ertêşê bi zelalî nîşan dide ku şkestina çeperê dagîrkerîya ertêşa Tirk ji Geliyê Zê dest pê kirîye. Geliyê Zê, serê davê ye û veresîye. Ev veresîna cepheyê dagîrîya ertêşê dê heta Guruna Sêwasê biçê û ev berxwedan û têkoşîna bizava neteweyî ya xelke Kurd û hêza gerîla, heta ku dawîyê li dagîrkerîyê û sistemê kolonyalîzma dewleta Tirk bîne dê dom bike...”

“...Êdî berpîrsiyarî ketîye ser milê hemû Kurdan: Xeleka destek û piştevanîya li dor hêza parastina Kurdistanê, li paş hêza gerîla, HPGyê, divêt bête mezintir kirin!..”

* [Ji nivîsara Rojan Hazim, *Geliyê Zê û Dien Bien Fu*, rojnameya YÖPê, 29ê Sibata 2008ê]

Agahdarî:

Du daxuyanîyên Konseya Rêvebir ya KNKyê yên Nîsana 2007ê, [KNK jî “Nota”yê dide dewleta Tirk û piştevanîya serokê Kurdistanê Federal Mesûd Barzanî dike & “Enfal” nayê ji bîr kirin] mixabin ku di weşana KNK Bultenê ya par da, hatine ji bîr kirin. Prensîba KNK Bultenê ew e ku belgeyên KNKyê bi armanca dokumentasyonê biweşîne. Lewma em wan herdu daxuyanîyan, digel tikaya lêborînê, di vê hejmarê da diweşînin.

KNK jî “Nota”yê dide dewleta Tirk û piştevanîya serokê Kurdistanê Federal Mesûd Barzanî dike

Dewleta Tirk dîsa ve borîzana xwe ya şer pifda. Kompleksa dewleta Tirk ya li ser bi giştî xelkê Kurd, navê Kurdistanê û avabûna Kurdistanê Federal gihiştîye dereceya nisaxîya psîkolojîk. Mezinên dewleta Tirk, her gotin û gefa li ser Kurda bo xwe heq dibînin, belê gava mezinên Kurda berevanîya xwe kirin, qîyametê radikin!. Eve çend roj in ku li ser axivtina serokê Kurdistanê Federal Mesûd Barzanî bayekî reş hatîye rakirin. Rêvebirên dewletê, serokên partîya û medyaya ertêşê, bi zimanekî gelek kirêt êrişî Mesûd Barzanî dikin. Binasê êrişkarîya wan jî kiviş e: Barzanî gotîye ku 30 milyon Kurd hene li Tirkîyeyê û heke dewleta Tirk daberizîne li ser Kerkûkê bike, ew jî dê li ser Dîyarbekir [Amed] û bajêrên di yên Kurdistanê mafê axivtina xwe bi kar bînin.

Mesûd Barzanî rast û di cih da axivtîye. Zikêşîya dewleta Tirk gelek e ji axivtinên Mesûd Barzanî. Barzanî gava digot; “pîrsa PKKyê, pîrseke polîtîk e” jî dewletê serê xwe li dîwaran dida. Mesûd Barzanî, bi vê reftar û van axivtinên xwe ve, hissîyata neteweyî ya xelkê Kurd

îfade dike. Axivtinên mezinên bizava neteweyî ya xelkê Kurd yên li ser pîrsên neteweyî hevdu digirin û timam dikin. Berî midehekê li ser gefên dewleta Tirk yên li ser Kerkûkê, endamê Konseya Rêvebir ya KKKyê Cemîl Bayik jî digot; “Em amade ne dijî êrişkarîya dewleta Tirk mil bi milê birayên xwe Kerkûkê biparêzin”. Dîsa serokê şaxê Amedê yê Partîya Civata Demokratîk [DTP], Hilmî Aydogdu jî digot; “Êrişeke li ser Kerkûkê, em dê wekî êrişa li ser Amedê qebûl bikin”. Dewleta Tirk bi hemû organên xwe ve, ji van axivtin û gotinên ku hissîyata yêkgirtî ya neteweyî ya xelkê Kurd îfade dikin gelekî aciz e. Hukûmeta Tirk li ser axivtina Mesûd Barzanî “Nota” da Iraqê!. “Şêwra Ewlehîya Neteweyî” [MGK] ya dewleta Tirk jî, di kombûna xwe ya 10ê Nîsanê da, bi giranî li ser axivtina Mesûd Barzanî û têkoşîna hêzên HPGyê rawesta û zimanê şer û êrişkarîyê derêxiste pêş. MGKyê destek da “Nota”ya hukûmetê û zêdetir êriş, şiddet û şer tewsiyeyî hukûmetê kir beramberî bizava neteweyî ya xelkê Kurd.

Dewleta Tirk bi van gef û gur û zimanê êrişkarîyê û herweha operasyonên leşkerî, bi agir dileyize. Dewleta Tirk divêt baş bizane ku êdî xelkê Kurd bi hêza xwe ya yêkgirtî ve, rê nade ku wisa bi sanahî hespê xwe bibezîne. Pêşeng û rêvebirên xelkê Kurd jî êdî bi şuûra neteweyî hereket dikin û dijî êrişkarîyên rejimên kolonyalîst û dagîrker bi yêk zimanî reaksiyona xwe nîşan didin ku eve pêşkevîneke mezin û giring e di vehûnandina yêkitîya neteweyî da.

Em wekî Kongreya Neteweyî ya Kurdistanê, KNK, bihayekî mezin didine reftar û axivtinên Mesûd Barzanî yên di derbareyê yêkitîya neteweyî û pozisyona dijî dewleta Tirk da û piştevanîyê dikin. KNK hêvî dike ku xelkê me jî dê desteka xwe di dereceya herî bilind da nîşan bide. Nîşandana reftara yêkgirtî ya neteweyî, bersiva herî mezin û xurt e beramberî “Nota”ya dewleta Tirk.

Konseya Rêvebir ya KNKyê

11 Nîsan 2007

**

“Enfal”, nayê ji bîr kirin

Xelkê Kurd bi salan e zulm û zora rejimên kolonyalîst û dagîrker dikêşe. Van rejiman bêdadîyên mezin bi serê xelkê Kurd îname. Çu sal û zeman neborîne ku ev rejimên xwûnxwar qetlîamekê nekin li Kurdistanê. Di vî demê hinde dirêj da rojek hat ku şiddeta dijmin gihiştê qonaxa birandinê. Yêk ji wan demên gelek reş û tarî jî sala 1988ê ye. Rejima Beasa Seddam Huseyn planekî xayîname pêkîna li ser xelkê me. Ji bihara 1988ê, ji meha Adarê pêve, şiddeteke bêtixûb bi kar îna û ji milekê ve bombeyên jehrê li ser xelkê barandin, li milê di jî xelk bi bi darê zorê ji gundan rakir û ber bi navçeyên Ereban ve bir. Biçûk mezin, jin û mêr, hizaran Kurd ji erdê bab û bapîrên xwe hatin rakirin û li çola Ereba bi komî hatin

kuştin. Rejima Seddam bihara 1988ê kire demê birandina Kurda û jenosîdeke mezin bi serê xelkê Kurd îna. Bi êrişên esmanî bombeyên jehrê barandine ser Helepçeyê û hizaran Kurd kuştin. Bi êrişên reşahî ve jî ref ref Kurd birin û bêseraşûn kirin. Bihara 1988ê, ji adar, nîsan heta gulanê, bi navê "Enfal"ê çarêk milyon Kurd li çolên Ereba bi saxî binax kirin. Bi "Enfalê" û komkujîya Helepçeyê, rejima Seddamî jenosîd bi kar îna li ser xelkê Kurd.

Îro bi avabûna Kurdistan Federal xelkê me li vî parçeyê welat gihiştîye azadiya xwe. Serkevtin û azadiya li parçeyê welatê me yê başûr û hilweşîna rejima Beasa xwûnxwar û kuştina Seddam û şîrkên wî, dilopekê jî be jana xelkê me tena dike, belê ew eş û jana wan salan nayê ji bîr kirin û divêt çu cara jî neyête ji bîr kirin. Li her derê cîhanê, li nav hemû welatan, roj û demên reş û tarî û bi xem, kul û keser, bi munasebeta rojekê jî be tene bîrînan û eve wekî tradisyonekê tete domandin.

Hukûmeta Kurdistan Federal jî [4 Nîsan 2007], 14ê Nîsanê wekî roja bîrînan "Enfal"ê qebûl û îlan kirîye. Em wekî Kongreya Neteweyî ya Kurdistanê, KNK, vê biryarê rast û di cih da dibînin. Xelkê me divêt, salê rojekê jî be vê bûyera dilsoj, vê qirkirina rejima Seddam Huseyn bîne bîra xwe û xelkê me yê di wî demî da hatîye kuştin, bi vîn û rêzdarî bi bîr bîne. Hiş û bîr bi van rojên kîvşkirî ve tene tazî kirin daku hovîya rejimên dijmin baş bête zanîn. Em careke dî xelkê me yê di "Enfal"ê da hatîye kuştin û bêseraşûn kirin, bi bîr tînin, sûcdaran jî rûreş û şermizar dikin. Bila vîn, rêz û silava herî mezin bo giyanê wan yê pak be. Navê qirkirina Kurda, "Enfal", divêt neyê ji bîr kirin!

Konseya Rêvebir ya KNKyê
11 Nîsan 2007

Şeirek ji

Mela Hesên Nozhetzade *

Bo Kongreya Neteweyî ya Kurdistanê

Kongreya neteweyî zor ciwan e
Dermanê derdê Kurdan e.
Ji mêjwe hatîye meydanê
Ji bo azadiya gelan e.
Hemî hîzbên li Kurdistanê
Bila cem bêne meydanê.
Kongreyê pir xweş û geş ken
Bikene çetra Kurdistanê.
Di bin siha wê çetrê da
Kurda bigihînine jîyanê.
Jîyaneke pir xweş û geş
Biafirînin li Kurdistanê.
Kurdistanêke yêkgirtî

Bê xebat çuca çênabe.
Werin bi hev ra hevgirtîbin
Li hemî parçeyên Kurdistanê.
Ala Kurdan bilind bikeyn
Şewqê bidete cîhanê.
Nezhetî bêje û her bêje
Ji bo azadiya Kurdistanê

Bijî Kurd
Bijî Kurdistan
Bijî Azadî

20 Nîsan 2007
Kurdistan

* Mela Hesên Nozhetzade, endamê KNKyê ye û ji Dizêya [Urmîye] rojhilata Kurdistanê ye.

Ji Edîtor:

Mesaja „Newroz 2008“ê: Ez Kurdistan im!

Di hejmarê pêncemîn ya KNK Bultenê da, [di sala nû, 2008ê da jî ya yêkemîn], daxuyanî û agahdarîyên KNKyê yê ji meha Çile hate meha Adarê cih digirin. Temaya vê hejmarê bi dengvedana xwe ya mezin ve bû Newroz 2008. Mesaja „Newroz 2008“ê gelek zelal û vekirî hate dan ji terefî milyonan ve: Ez Kurdistan im!

Newroza 2008ê li seranserê Kurdistanê û meydanên diasporayê bi giştî bi coş û heyecaneke mezin ya azadî û aşîyê hate pîroz kirin. Belê Newroza 2008ê bi taybetî li bakur dijî dewleta Tirk bû serhildan. Ji Hekarîyê heta Sêwasê, ji Qersê heta Osmanîyeyê, ji Stanbolê heta Mersînê, ji Ankarayê heta Izmîrê bi milyonan Kurd bi reng û dengê xwe yê neteweyî, yê Kurd û Kurdistanî derketin meydanan. Merkeza mezin bû Amed [Diyarbakir]. Bi hizaran Kurd bûne yêk deng, yêk giyan û banga azadîyê heta ber perê esmanî bilind kirin. Wan û Hekarîyê mixabin şehîd dan, belê dîsa ve bi berxwedaneke layiqî dîroka Newrozê cejna xwe pîroz kirin. Pîrozîyên li Botanê, li meydanên Şîrnex, Silopî û Cizîrê bûne pêlên bilind yê Dicleyê. Berîya Mêrdînê bû deryaya şahîya Newrozê. Ji Deştê Mûşê heta zozanên Agirî û Qersê, xelkê Newroza xwe pîroz kir. Mesaja „Newroz 2008“ê li bakur bû yêk slogan: Ez Kurdistan im!. Ev mesaja manadar gihiştê cihên ku divêt bibihîzin!. Êdî çu zulm û zora dewleta Tirk nikare vî dengî bibire!.

Heta hejmareke dî bimînin di nav xêr û xweşîyê da.

**

www.arsivakurdi.org

Adres:

Kongreya Neteweyî ya Kurdistanê [KNK]
Rue Jean Stas 41 / 1060 Bruxelles, Belgique
Tlf.: 0032 2 647 30 84 / Fax.: 0032 2 647 68 49
www.kongrakurdistan.net/com/org